UNHCR
The UN Refugee Agency

# Nameyên binghîn di derbarê qûnaxa duyemîn ji pêvajoya bidestxistina hemwelatiyê li gorî fermana yasayî(Qanûnî) a hejmara 13an a sala 2026an

## Min daxwaza bidestxistina hemwelatiyê pêşkêşkiriye. Gelo qûnaxa din çiye?

Piştî ku daxwaz ji aliyê rêveberiya karubarên sivîlî ve hate tomarkirin. Tu û hemû endamê malbatê ku di daxwazê de hatine tomarkirin ji bo beşdarbûna di hevdîtina kesane têne vexwendin. Di dema hevdîtinê de agahiyên ku we pêşkêşkirine dê werin piştrastkirin. Herwiha dê şoppê(Besme.Nîşana) tiliyên we û endamê malbatê li gel wêneyên kesane dê werin girtin ji we re.

## Ez çawa dizanim ku ji bo hevdîtinê hatime vexwendin?

Rêvebiriya giştî ya karubarên sivîlî ku yekem lîsta demjimêrên hevdîtinan li ser rûpela xwe a fermî ya Facebookê belav kiriye.




Ji kerema xwe bi awayekî berdewam rûpelê bişopînin ta ku hûn li ser nûkirina demjimêrên hevdîtinan agehdar bin. Herwiha hûn dikarin rewşa daxwaza xwe ji hêla bernameya karubarên sivîlî bi riya vê lînka taybet kontrolbikin.

Ji bo hûn demjimêrên hevdîtinên xwe bizanîbin pêwîste ku hejmara daxwazê ya ku di dema pêşkêşkirina daxwaza we de hatbû wergirtin ku wê pêwistiya we pê hebe.

## Çawe demjimêra hevdîtinê bizanîbin?

Du riyên hêsan hene ku bi wan demjimêrên hevdîtina xwe kontrolbikin.


### Bijartina yekem: bernameya karubarên sivîlî:

1. Lînka bernamê ya ku li ser rûpela Facebookê a rêveberiyê hatiye belavkirin barkin û daxînin li gel xwe.
2. Bernamê vekin û li ser beşa daxwazên hemwelatiyê bitkînin.
3. Hejmara ku hatî wergirtin di qûnaxa yekem de derbasbikin.
4. Dema ku demjimêra hevdîtina we hatibê diyarkirin wê dîroka wê bi derbaskirina hejmara daxwaza we diyar bibe.
5. Ger demjimêra we hêj nehatiye diyarkirin wê rewşa daxwaza we wekî ku li bendê ye xuya bibe.

Ji bo bikaranîna vê xizmetkariyê ne pêwîste ku hesabekî çêbikin.




Daxwaza hemwelatiyê
Lêpirsîn li gorî hejmara daxwazê
Daxwaza dawî
Hejmara daxwazê
**Amaje:**
Hûn dikarin hejmara daxwazê bi awayekî rasterast binvîsînin, an jî li ser xala li kêleka valehiya hejmara daxwazê bitkînin. Di vê rewşê de kamîre dê wêneyê bigrê û belgeyan bi awayekî otometîk bikşîne û hejmara daxwazê jî bi awayekî otometîk derxîne.
Tekezkirin




Demjimêrên hevdîtinê
Hêj demjimêra hevdîtina te tomarkirî tune ye
Ji vir bi awayekî hêsanî demjimêra hevdîtina xwe tomarbike û dest bi pêvajoya danûstandina xwe bike.
Tomarkirina demjimêra nû.
Gihîştina bilez
Dezgeh
Kontrolkirina belgeyan
Daxweazên hemwelatiyê
Zêdetir

Alîkariya zîrek
Bersivên bilez derbarê demjimêrên hevdîtinê, belgeyên pêwîst û navnîşanên navendan de.
Dest bi axaftinê bike.
Demjimêra hevdîtinê
Nûe
Xizmetkarî
Mîheng

**Bijartina duyem 2: kontrolkirin bi riya rûpela fermî a Facebookê**.
Serdana rûpela fermî a rêveberiya giştî ya karubarên sivîlî li Facebookê û li daxuyaniyên ku tê de demjimêrên hevdîtinan hatine belavkirin bişopînin.

## Ma divê zarokên min an mêr/jina min jî beşdarî hevdîtinê bibin?
Erê divê ku hemû endamên malbatê ên di daxwazê de hatine qeyîdkirin tev zarokan di hevdîtinê de amade bin.

Herwiha endamê malbatê ên ku li dervayî welatin û navên wan di daxwaza we de hatine qeyîdkirin ku dikarin piştî vegerin Sûriyeyê hevdîtina xwe bikin. Lê divê hevdîtin li Dîmeşq ê (Damaskos) werê kirin.

## Hevdîtina we dê li kuderê werê kirin?
Navendên hevdîtinê li gorî cihê  ku daxwaza we lê hatiye pêşkêşkirin dê were diyarkirin.

| Cihê pêşkêşkirina daxwazan | Cihê hevdîtinan werê kirin |
| --- | --- |
| Parêzgeha Hesekê | Hesekê û Dirbêsiyê: bajarê Hesekê (Encûmena xwecihî). |
| | Dêrik û Qamişlo: bajarê Qamişlo (Encûmena xwechî). |
| | Çil Axa (Cewadiyê): nivîsgeha(ofîsa) qeyîda Sivîlî. |
| Parêzgeha Reqa | Rêveberiya qeyîda Sivîlî – Bajarê Reqa |
| Dîmeşq (Damaskos) | Rêka sewra – Rêveberiya karubarên Sivîlî |
| Heleb | Dezgeha rewşa sivîlî a çaremîn a qeyda nasnamê (nifûsê) navenda ku berê bi navenda Polîsa Hewarî a Heleb ê dihat nasîn. |

**Têbînî:**
Ji bo kesên ku daxwazên xwe li navenda wergirtina daxwazan a parêzgeha Dêrazorê pêşkêşkirine ku wê rêveberiya karubarên sivîlî di demek paşê de dîrok, dem û cihê hevdîtinê bi awayekî fermî raghîne.

## Min dema demjimêra hevdîtina xwe winda kiriye. Divê ez çibikim?

Girînge ku tu û hemû malbata xwe di demjimêra diyarkirî de amade bin. Lê heke ji ber rewşeke awarte nikararin beşdarî hevdîtinê bibin, rêveberiya karubarên sivîlî dê demjimêrekî nû ji bo hevdîtina we diyarbike.

## Min hem rûpela Facebookê ya rêveberiya karubarên sivîlî û hem jî bernameya karubarên sivîlî kontrolkir, lê min demjimêra hevdîtina xwe nedît. Divê ez çi bikim?

Ji kerema xwe bi awayekî berdewam her du malperan kontrolbikin. Heke hejmara daxwaza we hêj xuya nabûye, dibe ku di lîsteyên din ên ku paşê werin belavkirin were bicihkirin.

## Ma ji bo beşdarbûna hevdîtinê divê ku pere were dayîn û pêşkêkirin?

**Na. Beşdarbûna hevdîtinê bi tevahî belaşe û bê pere ye.**

Heke kesek ji we bixwazê ji bo tomarkirinê an beşdarbûna hevdîtinê pereyan, ji kerema xwe vê yekê ji dezgehên peywendîdar re raghînin an jî bi parêzerên ku hevkarên UNHCR kardikin têkiliyê deyînin ta ku di hemû qûnaxên pêvajoyê de alîkariya we bikin.

## Bi bîr anîn:

- Hemû endamên malbatê divê li navenda diyarkirî amedebin ta ku şoppên(Besme. Nîşana) tiliyan û wêneyên kesane werin girtin.
- Biparêzin wergirtoka qûnaxa yekem, ji ber ku hejmara wê ji bo kontrolkirina demjimêra hevdîtinê pêwîste.
- Ev yekem koma hevdîtinane û di demên pêş de dê komên din re jî hevdîtin werin ragihandin.
- Heke hejmara daxwaza we hêj nehatiye belavkirin, daxuyaniyên nû bişopînin.

## Agehdar bimînin

Ji bo wergirtina dawîn nûvekirinên di derbarê demjiêrên hevdîtinan de û lîsteyên nû ên ku li ser rûpela fermî ya rêveberiya giştî a karubarên sivîlî li Facebookê bişopînin.

## Gelo pirsên te hene?

Heke li ser pêvajoyan pirs an jî hewcedariya şîreta(Yasayî) qanûnî hebe hûn dikarin bi hevkarên qanûnî ên UNHCR re bi riya hejmarên gerim ên telefonê têkildariyê bikin. Ew ê bersiva pirsên we bidin û di hemû qûnaxên pêvajoyê de alîkariya we bikin.

| | |
|---|---|
| Heyva Sor a Erebî ya Sûriyeyê li Hesekê | 0950033810 \| 0950033142 \| 0950033141 |
| Heyva Soe a Erebî ya Sûriyeyê li Dêrazorê | 0950033250 \| 0950033893 \| 0950033268 |
| Heyva Sor a Erebî ya Sûriyeyê li Heleb ê | 0950033576 \| 0950033231 \| 0950033236 |
| Heyva Sor a Erebî ya Sûriyeyê li Dîmeşqê (Damaskos) | 0948333853 \| 0960088857 \| 0950033241 |
| Heyva Sor a Erebî ya Sûrî li Reqa yê | 0987027692 \| 0987027693 \| 0995161711 |
| Rêxistina pêşkeftina Sûriyeyê li Dîmeşqê (Damaskos) û Heleb ê | 0951333672 \| 0951333692 \| 0951333691 |

Hemû xizmetkariyên qanûnî (yasayî) yên ku ji aliyên parêzeran ve têne pêşkêşkirin tevahî belaş û bê perene.